



Rastiyeke ku çî belge pê nevên ku Kerkûk û dewrûberên wê her ji serdemên kevin de devereke kurdnişîn bûye û parçeyek bû ji niştîmanê kurd-Kurdistan. Vê deverê: Kerkûk hîç girêdaneka cografî û kargerî bi Îraqê ve nebûye, cografînas û gerokên misilman, rojhelatnas û lêgerên Ewrûpî bi ronî

ev rastiye anîne ziman û amaje pê kiriye û ev mafê kurdan çespendine. Ji aliyê me ve siyasetvanên kurd ji rexekî ve û jimareyek ji dîrok nivîs, vekoler, nivîseran û ji rexekî din ve û

bi hemû renga bizavê dikin vê rastiya dîrokî ji bo dost û dijminan biselmînin her yek ji aliyê xwe ve û li gorê wan kereste, belge û tekstên dîrokî yên ku li ber destên wan in gelek xizmeta vê pirsê kirine û palpiştiyeka zanistî-dîrokî ji bo vê daxwaziya rewa ya gelê kurd

desteber kirine, ev kurte lêkolîne jî diçe di xaneyaya wan bizavan de.

K e r k û k - B a c i r m ê d i cografînasiya Îslamî de:

Di dîroka îslamê de û di çerxê siyê koçî /wêjeya cografî geştiyariyê (el-edebil cografî wel

## **Kurdistanîyeta Kerkûkê û dewrûberên wê Di sedên naverast de**

**Dr. Zîrar Sedîq**

rehelat) hate nas kirin. An ku pûtendan bi aliyê cografî û derbirîn ji topografiya herêmên dewleta îslamê, welatên dirawsê û tomar kirina her zanîneka peywendîdar bi bajar, bajêrk û gundên wî serdemî hebe her wesa diyarkirina dûratiya di nêva wan de û şewê giringiya wan. Bi dirêjîya çerxên naverast

jimareyek ji cografînasan û gerokan peyda bûn bi yadaşt û nivîsînên xwe aliyekî here girîngê şaristaniya îslamê ron kir û pirtûkxaneyê zanistî zengîn kirin. Ji wan:

1-Ibn xirdazibe (mirin 893ê zayinî, nivîskarê pirtûka ;(el mesalik wel memalik)

2-Ibn Riste(m.903zayinî)(el elalaq el nefise)

3-El yaqûbî(m.906 zayinî)pirtûka el buldan

4-Ibn el feqîye (m.923 zayinî) Ibin Alfeqî ye (m 923z) mixteser kîtab Albuldan

5-Almesûdî (m 957z) miroc alzeheb weltenbîh welîşraf.

6-Alistexrî (m 951z) meselik almemelik.

7-Ibin Huqul ( m 978z ) suretu alerd.

8-Almeqdisî (m 997z) ehzen alteqasîm fî merîfit alqalîm.

9-Ibin cubeyêr (m1217z), Rihle Ibin Cubeyêr.

10-Yaqut Alhemewî (m 1229z) Mucem albuldan.

11-Şêx Alribwe Alensarî (m 1327z) nuxbet aldehir fî ecayêb alber wel behir.

12-Hemdela Mistewî alqezwînî (m 1349z) nizhet alqulob.

13-Ibin Betote (m1337z) rihlet ibin batote.

Û gelek dengûbas û zanyariyên bi mifa ku derberîna hûr û girîng dane herêm û nawçeyên cîhana îslamê bê guman deverên

kurd nişîn jî ji wan nawçeyan bûne. Li vê derê pêdiviyê bihête gotin ku boçûn û axiftinên van rast û dirustin û cihê baweriyê ne jî ji ber du egeran:

1- Pitiriyê wan derbirîn û zanyariyan di destê wan de bûne bi çavê xwe dîtine û ji kesê din wernegirtine.

2- Ev çavkanîke bi awayekî giştî pitir ronahiyê dixê ser aliyên cografî, aborî, diravî, bînesazî, kargêrî û kêma li ser karûbarên siyasî serbazî disekinîn, ji ber vê yekê kêmtir ketine jêr kargêriya rewşa siyasî. Serarayî van her du xalan jî hinek ji wan cografînasan yê ku me bas jê kirî, xelkê bajarê Kurdistanê ne bi xwe Kerkûk û bajarên din yê Kurdistanê dîtine (Ibin Alfeqîye) Xelkê Hemedan e, (Ibin Huqol) bi nejadê xwe xelkê bajarê Nisêbîn e, (Ibin Xirdazebe) çendîn salan namebir û posteçîbûye li Kurdistana rojhelat.

Ev gerok û cografînas li ser gelek pirsên kargêrî û cografî li hev nekirine û zanyarî li ser vê çendê li hev guhertine bo nimûne; nerêkeftina wan li ser destnîşankirina hindê herêm û wîlayetên dewleta îslamê. Lê hemû kokin hev digrin derbarê wê yekê ku sinorên herêma

Îraqê ji aliyê bakur û li gor hemû gotinên wan ji bajarokê Kela Tikrîtê derbas nabe, (Ibin alfeqî ye) dibêje; Îraq bi dirêjîya xwe ji Ana ye ta dighe Besra (Mixteser Kîtab Albuldan r 153) lê (Ibin Huqol ) dibêje; Herêma Îraqê bi dirêjîya xwe ji sinorê Tikrîtê dest pê dike ta bajarê Ebedanê. Heta Tikrît bi xwe jî bajarekî erebnişîn nebû lê pitiriya akinciyên wê xirîstiyân bûn.

Ji aliyê rêvebirinê ve ser bi bajarê Mûsilê ve bû; Mûsil jî weku dihê zanîn, bingehê herêma Cezîrê bû (sûret elerd rû:205-208) ev her du gotinên han, nehevdiin, belku tamamkerên hev in, (Ibin Elfeqêh) ji aliyê rojava û li ser rûbarê Firat li ser rawestayê (Ibin Hewqel) ji rojhilatê li ser rûbarê Dîjle diyar kiriye. Rastiya wê ewe ku hêlek aşopî ji bajarê Tikrîtê li ser Dîjleyê bo bajarê Ane li ser Firatê dibe sînorê di navbera herêma Îraqê ji aliyê başûr ve û herêma Cezîreyê li bakûr, ev hêl wek rojhelatnasê Inglîz Lîstirinc(sala 1854-1933) bo wê yekê diçe ku ji dîtina cografiya siruştî nêzîktire ji dabeşkirina siruştî wek tu bibêjî bi dest duristkirî be û siruştî deşta pana fireh di navbera her du avan de duristkiriye û bi rengê du kertan: Kertê bakûr (memleketa Aşûriya kevin) ku pitiriya axa wê çerwane. Kertê başûr(welatê Babil yê kevin) ku

axa wê risobiye û bi xêr û bêre ku pire ji dara xurmê ku bi ava rûbaran dihê avdan(buldan elxilafe elşerqiye Rû:40-41) ango ne tenê ji aliyê kargêrî ve belku ji aliyê cografiya siruştî ve jî devera Kerkûkê ya ku ser bi herêma Cezîrê ve cudaye ji herêma Îraqê û çu hevbendî wan nagehînin hev.

Li dor çemk û wataya peyva Îraq jimareyek ra û boçûn hene ku zimanvan û mêjûnasên musulman derbirîne û Yaqûtê Hemewî tomarkirine. Herwesa (Murteza Elzubeydî) di ferhenga(Tac eleros) peyva Îraq şirovekiriye çend watayek bo anîne, ji wan hemû rayûboçûn û şirovekirinan em digehin wê encamê ku wataya Îraq ango : kenarê deryayê, qeraxê deryayê. Ango mebest ji Îraq ew devere ku nêzîkî deryayê ye, wate nêzîkî kendavê Farisî ye ku li serdemê Islamê bi Derya Faris dihat naskirin. Xelkê Hicazê bi xwe digotine her cihek nêzîk deryayan Îraq, ewan digote Kofe û Besra (elÎraqan) ango her du Îraq.

Li dor devera Kerkûkê û ji demên kevin ve di çavkanîkên Siryaniyan de, Kerkûk bi (beith girmy-bacirmî) hatiye naskirin û ev jî bi xwe peyvek lêkdaya Siryanî-Kurdiye û ji du peyvan pêk dihê: (beith) peyvek Siryaniye, wataya wê ango welat û di zimanê Erebî de bûye

(beyt) peyva duyê cirmî ango germî bi zimanê Kurdî. Li gor vê yekê (beith girmy) ango welatê gerim-germiyan ku di jêderên Erebi de bi navê (bacirmî) tomar bûye, Mesûdî li cihekê base welatê sar û welatê germ dike (bilad elsuod we bilad elcurom).

Her xwedî kelhek kevin li Kerkûkê bi (elkerxinî) dihat naskirin, Yaqûtê Hemewî ku tere derbazbûye bi kurtî pênasekiriye (Muicem elbuldan 4/450) her wesa dibêje (bacirmiq-bacirmê) nawçeyeke nizîk Daqoqa niho ye (Muicem Elbuldan 1/313).

Cografînas û gerokên musulman çu guman nehêlane ku bajar û bajarkên Daqoq, Xanîcar (Kanîhincîr(?)), Kirxîn û devera Bacirmê- Bacirmiq, bi dirêjîya çerxên naverast ser bi herêma Cezîreyê ve bûne (Ibin Xirdazbe, Elmesalik û memalik, Rû:85, Ibin Riste, Eleilaq elnefîse, Rû:103, Şêx elrebwe elensarî, Nuxbet eldehir, Rû:255), lê Hemedalla Mistewfî EL Qezwînî ku li serdemê Moxoliyan jiyaye her çende cext li ser wê yekê dike ku sinorê Îraqê ji Tikrîte ber bi xwar dirêj dibe û bajarkên dûcehil Daqoq, Zengebadî, di nava çarçoveyê Îraqê (nezhet el qulu Rû.42-44) di rastî de Moxolan destkarî di sînorên herêm û wîlayetên xîlafeya Ebbasî de kirine.

Kerkûk Beşeke Ji (Cîbal el Ekrad-Kurdistan)

Moxolan piştî ku li sala 1258 Bexda ya peytext dagir kirin û xîlafeya Ebbasî ji nav birin, wekû hatî behskirin ew rabûn bi *e n c a m d a n a h i n d e k* gorankariyên kargêrî û destkarî kirin û guhorîna nav û sînorên çend herêman ji encamê wê yekê ji bo cara yekê li navarasta çerxê 13 yê z. herêmek derket bi navê Kurdistan ku yeke yeka rêveberiyê bû û pişkek bû ji wê devereka kurd lê hebûn ji wî demî were çavkanîk tekstên farisî, tirkî berdewam peyva Kurdistan bi kar dihînan weku navekî fermî yê welatê Şarezor û rojhelatê Kurdistanê. Lê çavkaniyên erebiyên Misirî û Şamî li serdemê Memlûkî 1250-1517z. li cihê peyva Kurdistan (Cîbali kurd) bi kar dihîna ji ber wê yekê ku pitiriya erdê Kurdistanê çiyayî ye û Kurdistan jî ne peyveka erebî ye û ta radeyekî peyveka namo ye jî, ji nêzîk sehkirinan rawestan li ser wan çavkaniyan ronî dibe ku mebest ji (cîbal el akrad) hemû bajar û deverên kurdan bi xwe ve digre.

Dewleta Memlûkî li Misir û Şamê hevbendiyeka dostane gelek bi hêz bi sercem destheletdar û mirnîşînên

Kurdistanê hebû her dem hatin, çûn, name hinartin, alîkariyên serbazî û hevhelwestiya siyasî di nav her du aliyan de hebûn.

Mêjûnasên Memlûkî gelek dengûbas û zanyarî li ser vî alî nivîsandine nivîserên dîwana dariştin û namehinartinê (Dîwan El İnşa Wel Mektebat) e Memlûkî name, peyam û dengûbas amade dikirin û arasteyî mîr, serdar, serok hozên Kurdistanê dikirin û posteyê Kurdistanê jî werdigirtin.

(Şahabettîn Ahmed Bîn Yehya bin Fazilellah El Umerî, 1301-1348z.) Ev kes ji bo demekî fermanber bûn li dîwana dariştin û name hinartinê, nivîser û amadekerê name û peyaman bû û her wesa nivîser û mêjînivîsekî bi hêz bû. Nêzîkî 17 pirtûkan danane û ya ji hemûyan giringtir pirtûka (Mesalik el ebsar fî memalik el emsar)e, di bîst bergên qebare mezin de hatine, di bergê siyê de (elsifir essalis), buxteyeka zanyarî bi mifa û giranbûha li ser Kurdistana çerxê 13 û 14êz. pêşkêş kiriye jimareyeka bajar, bajêrk, kelhe, gund, hoz û xêlên kurdî nasandine, sînorê herêma (Cîabal el Ekrad) diyar kirî û nav û pênase ya 20 cihan li herême existîne berçav lê mixabin ev pirtûk her ve û wê ve

ta ku hindek berg jê hatine çapkirin û hêştta li gor agehiya me hemû pêk ve çap û belav ne bûye, li demê xwe destnivîsekî temam li pirtûkxaneyê kûrî zanyariya Îraqî li Bexda yê hebûn.

Tiştê li vê derê ji hemû tiştêkî din giringtir ev e ku (ibin fazilellah el umerî) pêş 650 rasterast bi aşkerayî amaje bi vê yekê kiriye ku (el kexîn û daqoq el saqiya) ser bi (cîbalil Ekrad) ve ne an ku Kerkûk û Daqoq ser bi Kurdistanê ve ne weku ez dizanim ku ev kevintirîn belge ne li ser Kurdistaniyeta Kerkûk û Daqoqê.

Di meydana axavtinê derbarê cih û hozên (cîbal el Ekrad) de di ber perê 127ê belgê 3ê dibêje: Pişt wan-li vê derê mebest hozeka din ya kurdî ye- welatê Kexîn û Daqoq (el saqiye) dihê-jimareya wan- ew hoza kurdî-pitir ji 700 kesan, tenê jimareya çekdar û cengawer-û mîr û Şûcaeddîn Ebabekir mukir li ayinê xwe dikir.

(El qelqîşhindî 1418z.) ku ew jî nivîser bû li dîwana dariştinê û ev axavtina (el umerî) bi vî awayî veguhastiye bo pirtûka (Sibeh el ehşa 4/375).

Paş Umerî çendîn gerok rojhelatnasên Ewrûpî ev rastî

tekez kirin, gerokê Îtalî yê navdar Pietro Dilavala 1586-1652. ku li destpêka çerxê 17-yê zayinî seredana rojhelatê kiriye, di nameyekî de ku ji bo hevaleke xwe şandiyê li roja 17-ê adara 1617-ê. dibêje ku di Kurdistanê re derbaz bûye û ew welate ji rojava bo rojhelat ta nêzîkî 12 rojan rêyeke û ji bakûr bo başûr yekcar dirêj e û ji axa Bexda yê û Sosê destpê dike û ta paş Mûsilê û welatê Medya û Ermeniya dirêj dibe(rêhlet dîlaveliya îlel Îraq) .

Li salên 1573-ê-1575 nojdarê Hollendî Leonard Rauf, bi niyaza komkirin û naskirina giyayê nojdariyê geşte rojhelatî kir. Li roja 24/12/1574-ê zayinî gehiştê bajarê Tawîq- Gawix-Daqoq û bi vî rengî behs ji yadaştên xwe dike: (bi dirêjiyeka kurt ji aliyê Tawix kelheyeke qaîm nedît û dikeve devera kurdan ku ji vê derê dest pê dike û bi dirêjiya rûbarê Dîjle diçe ta digehe Ermenistanê) rehlet errehale el Hollendî Leonard Rallof R.126) û li roja 26/12/1574-ê digehe Kerkûkê û wesfa wê dike û dibêje li wê derê em naçar bûn li wergerekî zimanê kurdî bigerin (Rîhlet Leonard Rallof R.197-198) û li serdemê Osmaniyan Kerkûk bingeh û baregayê wîlayeta Şarezor bû.

**Çavkanî:**

1-Pietro Dilavela, Rihlet Dîlevela îlel Iraq, Dr.Petros heddad ji zimanê Îtalî kiriye erebî.(Bexda,2001)

2-Ibn Xirdazibe, el mesalik wel memalik(Beyrût 1988)

.)

4-Ibn hewqel soretil el erd(Beyrût 1979)

5-Ibn Riste-el eh laq el nefîse(Beyrût 1988)

x x

998

7-Ibn Fadillelah el Umerî-mesalik ebsar fî memalik el emsar(Mixtût)

8-Ibn elfiqî el himdanî Mixtisir kitib elbildaz(Beyrût 1988)

9 987

0L x g

x 954

11-Leonardo Rawlof rihle el rihele el hulindî liwînharit Rawlof, tircime:Selîm el Tikrîtî(Bexda 1987)

12-Yaqût elhûy, mihcim el bildan(Beyrût 1995)